



## Pêdivîya min bi çi belge heye?

- Nêrîneka gistî ji perwerde û xebatên şolê yê pêştir (bi zimanê Elmanî)
- Belgeyêb nasnameyî (karta nasnameyê an jî pasaport)
- Belgeya perwerdeya pîşeyî û bekelorya perwerdeya bidestketî li derveyî welat
- Belgeyên taybbet bi tecrûbeya karî û perwerdeya bikind
- Danezana ser vê esasê ku heta niha daxwaza testa danberheva nirxê nehatîye pêşkêş kirin
- Delîlên ser vê ku hûn dixwazin li Elmanyayê da şolê bikin (ji bo hemwelatiyên YE, Herêma Aborî ya Ewropayê û Swîsre û herweha kesên ku li derve yê welat da dijîn bi pêwîst nîne)

Ji bo karên di bin çavdêrîyê da carna jî belgeyên din jî pêwîstin. Pêşîyê da ji rêveberîya taybet ser ev babetê bipirsin.

**Gırîng:** Bi piranî divê belgey pê wergêrra Elmanî û bi rewşa kopî ya ser eslê, bên pêşkêş kirin. Di pêş da bipirsin ka werger divê ji aliyê wergêr fermî pêk bê.

## Ez dikarim ji kû agahî bistînim?

Bo zanîna vê ka şola we bin çavdêrîyê da ye, kîjan qanûn şamilî we dibin û bo lêkolînkirina pisporî ya xwe dikarin serdana kîjan navendê bikin, dikarin li ser înternetê peyda bikin. Ev agahî û herweha navendên şêwirdariya di herêmên jîyana xwe da li vir bibînin **www.anerkennung-in-deutschland.de**.

Bi rêya telefona xwe dikarin agahiyên ji „**Hotline Arbeiten und Leben in Deutschland**" (**Telefona Şol û Jîyan di Elmanîya**) bi jimareya: **+49 (0)30 1815 - 1111** verbigirin. Ji bilî mijarên têkildar bi danberhev kirina belgeyên pîşeyî yê biyanî yê hevalan, hêla telefonî liser peyda kirina şolê, têkietinê û rûniştinê û herweha hîn bûna ziman jî, ji were rabêjê dide.

Hotline
Working and Living
in Germany
**+49 30 1815 – 1111**


**Agahiyên belavkirinê**

**Belavker:**
Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
Referat Steuerung der Projektarbeit, Integration durch Sport, Informationsmanagement
Frankenstraße 210
90461 Nürnberg

**Jêder:**
Publikationsstelle des
Bundesamtes für Migration und Flüchtlinge
www.bamf.de/publikationen

**Roja belavkirinê:** 03/2015

**Çap:** Silber Druck oHG, Niestetal

**Dîzayn:** KonzeptQuartier® GmbH, Fürth

**Wêne / Mafê belavkirina wêneyan:** Pamela Moore, imageteam, auremar, diego cervo, Mustafa Arican, Ingo Bartussek, Stephan Morrosch, contrastwerkstatt

**Civata Nivîskarî:**
Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
Referat Informationsservice Migration

Li vir gel me hevdîtinê bikin
www.facebook.com/bamf.socialmedia

**www.bamf.de**

**KURDISCH** 032015 Anerkennung


Bundesministerium
für Bildung
und Forschung

Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

# Danberhev kirina belgeyên pîşeyî yê biyanî



**ANERKENNUNG**
IN DEUTSCHLAND

## Çima divê belgeyên min yê şolê bçne nirxandin?

Ji 1ê Nîsana 2012 ev derfete pêş hatîye ku belgeyên şolê ku we li derveyî welêt bidest xistine gel pêdivîyên ev şolê li Elmanyaya bêne danberhev kirin. Ev babete demekê balkeş dibe ku hûn bixwazin şolê bin çavdêrîyê di Elmanîya da bidest bînin.

„Bin çavdêrî“ tê ev wateyê ku tu bê wergirtina destûra dewletî û nirxandina pisporîya ya pîşeyî ya xwe izina kirina ev şolê bidest nayinî. Di Elmanyayê, zêdetir ji tevahîya şolan, şolê beşa tenduristî û perwerdehiyê (wek bijîşk, hemşîre, yan mamoste) bin çavdêrîyê da ne. Li gel vê, ji bo serbest pêkanîna hinek şolan zagonên taybet hene (wek baker an barber).

Di karên ku bin çavdêrîyê da nînin, ji bo xebatê, pêdivî bi danberhev kirina fermî ya belgeyên tune ye (wek karmendê firoşgehê, an aktîvistên IT yê). Li vir tu dikarî bê nirxandina pîşeyî jî bikevî nava bazara kar. Lê, nirxandineke taybet dibe ku ji bo vê yekê kêrhatî be ku karsaz tê bikare kapasîteya te baştir binirxîne.

**Gırîng:** Neteweya we bandora li ser vê pêvajoyê tune. Destûra rûniştinê jî pêwîst ne. Hûn dikarin heta dema ku li Elmanya najîn jî daxwazê pêkêş bikin. Divê belgeya pîşeyî ya derveyî welat berdestê we be û hûnzbikaribe îspat bike ku bi niyet in ku kar li Elmanya da kar bikin.

## Pêvajoya çava pêktê?

Belgeyên şolê ku we li derveyî Elmanyayê bi deste anîne ser daxwaza we tê gel belge yên teknîkî û pîşeyî yê Elmaniya bihêt danberjev kirin. Ji bo pêşkêşkirina daxwazê dibe serdana navendê bikî ku berpirsê koma şola we ye. Agahî li ser Navendên berpirsê bazirganiyên yên cuda, liser Internetê (**www.anerkennung-in-deutschland.de**) yan telefonî (**+49 (0)30 1815 - 1111**) peyda bikin.

Di asta yekem divê biryarê bigirin ka belgeya we gel pîşeyî û teknîkî ya kîjan şolê di Elmanîya da bê danberhev kirin. Navenda berpirsê we, tê di vî warî de alîkariya we bike.

Piştî radest kirina belgeyê, tê bê lêkolîn kirina ka cûdahîyek mezin li navbera belgeya we ku li derveyê welat isandîye gel gelgeya pîşeyî û teknîkî ku li Elmanîya heye, yan na. Eger wisa be, dikarin ev cûdahîyê pê radest kirina belgeyek dî yan tecrubeya karî çareser bikin. Eger belgeyên we ji bo nirxandina belgeya pîşeyî kêm be, dikarin pê nirxandina pisporî, ji bo nimûne, an jî bi kar kirina ceribandinî yan bi hevdîtinên pisporî, pêk bînin.

## Encamên muhtemel çi ne?

Ger ku cudahiyeke mezin navbera pisporîyên we û belgeyên Elmanî da tune be, bawernameya hevcotîya tam yan – eger pêdivîyên dî yê gengaz jî we hebin- izina şolê tê bê radest kirin.

Bi vê belgeyê hûnê karê xwe bikin, wek ku ew bi belgeya teknîkî û pîşeyî ya Elmanîya pêk tê.

Heke di pêvajoyê da cudahîyên mezin di navbera pisporîya we û belgeya teknîkî û pîşeyî ya Elmanîya derkete holê, bo şolên ku bin çavdêrîyê da nînin, tê belgeyek rasdetî we bibe ku ev cûdahîyene bi zelalî aşkere kirine. Bi vî awayî, hûn dikarin rasterast ji bo karsazan daxwaza karkirinê yan perwerdehîya bilinda kêrhatî xwe bidin. Dikarin ji bo karên bin çavdêrîyê cudahiyan çareser bikin. Girêdayî bi şolê, divê beşdarî kurseke perwerdeya hevcotîyê an ceribandinek pisporî bibin.

## Ev pêvajoye heta kengê tê bidom e?

Dema ku tevahîya belge temam bûn, lê pirê caran pêvajo bêtir ji sê mehan nakşîn e.

## Xercê pêvajoyê çiqas e?

Xerc di navenda berpirs de zelal dibin. Îcar ji kerema xwe ve, pêş radest kirina daxwazaê agadarîya we ji xercên gengazî hebe. Eger hûn wek kesekî ku pey kar digerên an jî xizmetên civakî werdigirin, dibe ku di hin rewşan de xerc ji alîyê dezgeyên dewletê bêne qebûl kirin.





